

Çend Gotin li Ser Yûsuf û Zuleyxaya Selîmê Hîzanî

AYHAN GEVERÎ

ayhangeveri@gmail.com

Yûsuf û Zuleyxaya
Selîmê Hîzanî,
piştî Mem û Zînê
mesnewiya duyem e
ku di Kurdî de hatiye
nivîsîn. Lê bi mijara
xwe ve jî mesnewiya
ewil e ku ji hikayetek
gîştî -ku ne tenê di
jiyana Kurdan de heyî-
hatiye nivîsîn

Yûsuf û Zuleyxa, qisseyek cihanî ye ku hem di edebiyata rojava de hem jî di ya rojhilatê de bûye mijarên berhemên edebî. Ew hikaye ji ber ku di *Qur'anê* de bi şiklê "ehsenu'l-qesses" yanî "hikayeta herî xweş" hatiye bi navkirin, şairên alema Îslamê gelek ji wê hez kirine û ew serpêhatî her dem hatiye nivîsîn. Her wisa di edebiyata rojava de jî cihê çîroka Yûsuf û Zuleyxayê gelek mezin e ku Ernest Renan derheq wê çîrokê de gotiye "*ne ku romana herî kevin, belkî ya ku heta niha qet kevin nebûyî ye*" (Ertaylan 1960: 1). Di edebiyata rojava de ji bilî nivîsîna wê hikayetê her wisa metnên rojhilatê jî bi baldariyek mezin hatine teqîbkirin û mîsalen *Yûsuf û Zuleyxaya Mela Camî* (1414-1492) tercumeyî zimanên Fransî û Îngilizî kirine.²

1 Ev nivîs ji beşa destpêka xebata Ayhan Geverî ya bi navê Yûsuf û Zuleyxaya Selîmê Hîzanî ligel kurtkirinê hatiye standin ku ew berhem dê di demek nêzik de ji nava weşanên Nûbiharê derkeve.

2 Aguste Bricteux, *Djami: Youssouf et Zouleikha*, Paris 1927; David Pendlebury, *Yusuf and Zulaikha* by

Ew hikaye di *Qur'anê* di sûreya "Yûsuf"ê de dihête vegotin ku di wê sûreyê de mijar jî serî heta dawiyê hikayeya Yûsuf û Zuleyxayê ye. Beriya *Qur'anê* ew çîrok di kitêbên din yên muqeddes de jî hatiye gotin ku jixwe ew di *Tewrat* û *Incîlê* de jî bi şiklek berfireh derbas dibe. Di kitêba ewil ya *Tewratê* beşa "Tekwîn- Bab 0-50"ê de û di *Incîlî* de jî di beşa "Karên Resûlan – Bab 7"ê de tête neql-kirin (Çetin 2004: 10).

Di *Qur'anê* de helbet ne wekî hikayek edebî hatiye vegotin ku divê nehête jibîrkirin ku Yûsuf bixwe pêxember bû û babê wî Hz. Ye'qûb jî hem pêxember bû hem jî ji Hz. Ismaîl ve ji nesla Hz. Ibrahîm bû. Bi vî şiklî ve *Qur'an* vê hikayetê wekî serpêhatiyek rast radigihîne û ji muxetabên xwe re îşareta îbretan dike ku ew jî jiyana Ye'qûb, Yûsuf û kesên di yên çîrokê werbigirin. Hikayet herçend bi navê Yûsuf û Zuleyxayê ve meşhûr bibe jî (ku di *Qur'anê* de jî bi navkirina

Hakim Nuruddin Abdurrahman Jami, London: The Octagon Press 1980. binêre: (Kut 2003: XI).

sûreyê ve tenê navê Yûsuf derdi-keve pêş) di vê hikayetê de ji jiyana herkesî peyamek dihête ve-hinartin bo xwendevanan. Lewra êşa ku Hz. Ye'qûb ji bo kurên xwe (Yûsuf û Binyamîn) dikêşe; îmtihana Hz. Yûsuf bi birayên xwe, çalê, zindanê, Zuleyxa û bab û birayên xwe re; hesûdiya birayan bo birayan; eşq û evîniya Zuleyxayê ya bo Yûsufî... hwd hemû di nava hikayetê de wekî çîrokên sereke xuya dikin. Lê herçend ew hemû şexs her yek bi serê xwe serpêhatiyekê bijî jî, ew û ew hemû serpêhatiyên cuda di nava kompozisyonekê de wê çîrokê temam dikin.

Yûsuf û Zuleyxaya Selîmê Hîzanî:

Di edebiyata klasîk de şairan çî bi Farisî çî bi Kurdî an jî çî bi Tirkî û Erebi nivîsîbin 'mebest' û 'amac' her eynî bûye: 'Eşq û rindîtî. Wêca ew vegotina 'eşq û rindîtîyê digel gotin û usûla şairî dibû yek parçe û wisa dike-te bazara hûnerê. Di vê bazarê de mebest 'eynî ba jî şarazayî û hostatî jî hedefek dî bû. Ji ber hindê jî şairan di wê bazarê de bi mezmûnên nû reqabeta xwe dikir; bi îmajên taze û bakîr ve şarazatiya xwe îsbat dikir. Wan ew reqabet û îsbatkirina qebiliyetê jî bi du şeklan pêk diînan; yek, nivîsîna mesnewiyan; du, nivîsîna xezelan/qesîdeyan. Lewra di wê şîrê de her tişt bi du cûyan re diherikî, yan bi xezel û qesîdeyan yan jî bi mesnewiyan.

Yûsuf û Zuleyxaya Selîmê Hîzanî, piştî *Mem û Zînê* mesnewiya duyem e ku di Kurdî de hatiyê nivîsîn.³ Lê bi mijara xwe ve jî

Nivîsîna Mem û Zînê û belavbûna wê ji aliyê şekl û qalibê ve teqlîdkirina xwe jî ligel xwe înayê. Mîsalen di hikayeyên Leyla û Mecnûn û Yûsuf û Zuleyxayê de em tesîra wê bi aşkerayî dibînin

mesnewiya ewil e ku ji hikayetek giştî -ku ne tenê di jiyana Kurdan de heyî- hatiye nivîsîn. Ji ber ku serpêhatiya Yûsuf pêxember û Zuleyxayê di *Qur'anê* de bi şiklê "xweştirîn qîsse" hatiye bi navkirin, ew ji aliyê gelek şairan ve hatiye nivîsîn. Di Kurdî de jî yekemîn *Yûsuf û Zuleyxa* ya Selîmê Hîzanî ye.

Gava ku mirov bi vî çavî li *Yûsuf û Zuleyxaya Hîzanî* dinêre bi gelemperî du tişt/tesbît li ber mirov aşkere dibin. Yek, Selîmê Hîzanî şairek şaraze ye, wî şairên beriya xwe û berhemên wan baş nasîne û hakimiyeta wî ya li ser lîteratura klasîk gelekî serkeftî ye. Du, wî hem bi awayê vegotina şîrê û usûla xwe ve hem jî bi fikra xwe ya şexsî ve (fikra "milletperweriyê" ve) Ehmedê Xanî kiriye pêşewa, ku ew di rêya wî de çûye.

Gelo ev Yûsuf û Zuleyxa ya Ehmedê Xanî ye?

Bi giştî di piraniya lêkolînên li ser edebiyata Kurdî yan jî derheq Ehmedê Xanî hatine nivîsîn

qesta me mesnewiyên "hikayî" yên "evîni" ne, jixwe eger ne wisa be yekemîn mesnewî *Mem û Zîn* nabe, lê *Nûbihara Biçûkan* lazim e bê hisabkirin...

de behsa berhemek Xanî tê kirin ku ew jî *Yûsuf û Zuleyxa* ye. Lê li ser destxetên Kurdî bi awayek piralî xebatên ciddî nehatine kirin ku ew baş bêne tesnîfkirin. Lewra şair yan jî muellif berhema xwe dinivîse û ji wê meydanê xwe vedikêşe ku êdî em bi destxet û mustensixên wan ve tenê dimînin. Ji bo wê jî gava li ser destxetan tête xebitîn, divê ew şert li ber çavan bêne girtin. Çinku destxetên orijinal (yanî nusxeyên muellifan) li ber destê me nînin û yê ku nivîsî çawa nivîsibe êdî ew tenê di nava destê me de dimînin. Mustensix gelek caran bêhemdê xwe kelîmeyan jibîr dike, xelet dinivîse, kêmdinivîse yan jî di temamê metnê de tehrîfatan dike, hetta navê xwe cih bi cih diêxe nava metnê. Ew ne tenê muşkileyên destxetên Kurdî ne, temamê destxet malûlê wan muşkileyan in.

Vêca meseleya nusxeyên *Yûsuf û Zuleyxayê* û nîsbeta wê berhemê bo Ehmedê Xanî jî hinekê bi van probleman ve girêdayî ye. Beriya ku em vê meseleyê vekin, ji bo ku mesele baştir bête famkirin, em li gotinên Izeddîn Mistefa Resûl vegezin. Ew piştî ku behsa du destxetan dike ku nîsbet Ehmedê Xanî tene kirin û ji wan jî yek *Yûsuf û Zuleyxa* ye, wisa dibêje:

"Di van salên dawî de em rastî hin îşaretan hatin ku Xanî *Yûsuf û Zuleyxayek* nivîsiye.

Piştî ku ez li hûrûhûr li ser destxetên *Leyla û Mecnûn* û *Yûsuf û Zuleyxayê* xebitîm, min çend delîl dîtin û ez piştrast bûm ku ew ne yên Xanî ne. (...) Û eger em bêne ser *Yûsuf û Zuleyxayê* jî, ew jî nusxeyek

3 Helbet li vir gava em dibêjin "mesnewî"

din ya Selîm b. Silêman bû ya ku Kutubxaneyên Destxetan yên Berlîn û Lenîngradê dihête parastin.

Nivîsîna *Mem û Zînê* û belavbûna wê ji aliyê şekl û qalibî ve teqlîdkirina xwe jî ligel xwe îna ye. Mîsalen di hikayeyên *Leyla û Mecnûn* û *Yûsuf û Zuleyxayê* de em tesîra wê bi aşkerayî dibînin” (Resûl 2007: 50-51).

Ev gotinên Resûl ên redda wê qinaeta li ser “*Yûsuf û Zuleyxaya Xanî*” dike li aliyekê, ew tesbîta wî ya li ser “*di van salên dawî*” bi ya me muhîmtir e. Lewra bi qinameta me jî ew fikra li ser wê ‘berhema Xanî ya ne diyar’ fikrek taze ye û sebebê wê jî wekî me li jor jî gotî muşkileyên di destxetan de ne.

Di hin nusxeyên di destê me de hem di pêşî hem jî di paşiyê destxetê de behsa Ehmedê Xanî tê kirin ku ew jî bi temamî “fîkr” a wî kesî ye yê ku ew nivîsiye. Lewra ew nusxe hemû jî nusxeyên nû ne û piştî ew fikra li ser Xanî belavbûyî, hatine nivîsîn.

Kerem Soylu di kovara *Zendê* de bi navê “*Yûsif û Zuleyxa: Nusxeya Ehmedê Xanî*” nivîsek weşandiye⁴ û tede îsbata mulkiyeta nusxeyekê li ser Xanî dike. Lê ew jî xeletî û kêmasiyên mustensixan tekrar û vê meseleyê aloztir dike. Ji bo zelalkirina vê mesele jî em li ser vê nivîsa Soylu çend tesbîtên xwe bibêjin: Yek, beriya her tiştî Kerem Soylu bingeha îddiyayên xwe bi şiklek saxlem û rêkûpêk



Ji ber ku serpêhatiya Yûsuf pêxember û Zuleyxayê di Qur'anê de bi şiklê “xweştirîn qîsse” hatiye bi navkirin, ew ji aliyê gelek şairan ve hatiye nivîsîn. Di Kurdî de jî yekemîn *Yûsuf û Zuleyxa* ya Selîmê Hîzanî ye

nedanaye û gotinên wî yên li ser Xanî nagehine çi delîl û îsbatan. Du, Mamoste Soylu di gelek cihan de herfên Erebi xelet xwendine, tarîxên li ser nusxeyan tevlihev kirine. Her wisa ji ya hemûyê sosrettir jî gotinên wî yên di nivîsa wî de hevûdu nagirin û ew nivîs muhtacê hinek dî lêkolînê bû...

Kerem Soylu di nivîsê de behsa sefera xwe ya Suriyê diket û mebest ji wê seferê jî peydakirina nusxeya Xanî bûye. Piştî wî ew “nusxeya Xanî” ji Mele Remezanê Berzencî standî, wî ew ligel ya Selîmê Hîzanî (ya ku Feqî Huseyn amade kiriye) muqayese kiriye û gelek ferq dîtine. Li ser wan ferqan îsbata nusxeya Xanî dike û hejmara beytên di navbera herdu nusxeyan de ne pêşkêşê xwendevanan dike. Ji ber ku di destê wî de tenê nusxeya ku Feqî Huseyn hebûye, wî jî li ser vê xebata kêma ew

nusxeya nû wekî ya Xanî daye nasîn. Ji bo îsbata xwe jî beşa “sebebê nezma kitabê” mînak dide ku ew di nusxeya “Xanî” de heye lê di ya Feqî Huseyn de nîne! Soylu vê nivîsê di 2010ê de dinivîse û wan malikên wê beşê bi temamî neql dike (ku ji wan gelek xelet hatine xwendin) lê qet li xebata Doskî ya li sala 2004ê hatiye çapkirin venagere. Lewra ew beytên ew dibêje jixwe di xebata Doskî de jî hene.

Mamoste Soylu piştî ku wan beytan bêserûber vediguhêze vê carê jî muqayeseya wê nusxeyê ligel *Mem û Zînê* diket. Wî di nusxeya Suriyeyê de sê beş dîtine ku di ya Feqî de nînin; ku ew jî îsbata wî ‘xurttir’ dike:

“Her wisa şêwaz û îcaza van her sê mijaran [beşan] jî gelek dişibin ên *Mem û Zînê*. Di mijara duyem de malikeke hinek dişibe a *Mem û Zînê* heye: “*Bobekr û Omer ecêb şîrîn in/Os-*

4 binêr: Soylu, Kerem. (2010). “Yûsif û Zuleyxa: Nusxeya Ehmedê Xanî”. *Zend*. hej: 12, r. 58-61.

man û E'îlî çî xweş Letîf in”

Dîsa di beşa sisêyan de sê heb malik hene wek i[q]tibas di Mem Zînê de tene dîtin:

Lakîn ez jî mame çar û naçar
Nîn in ji qumaşî ra xerîdar
Sed barî tijî bikî cewahir
Sed new'î ji tuhfê û denadîr”
(Soylu 61).

Wekî Izeddîn Mistefa Resûl jî îşaret kirî, mesnewiyên piştî *Mem û Zînê* hatî bi şiklek tabîî di bin tesîra wê de mane. Her wisa metafora qumaşî jî ne tenê di *Mem û Zînê* de heye, ew di temamê edebiyata klasîk de heye ku şair ‘huner’ û ‘şîir’a xwe wekî qumaşî bi qedr û qîmet dibînin. Wêca ew jî nabe delîl ku *Yûsuf û Zuleyxa* ji ber *Mem û Zînê* hatibe nivîsîn yan jî ew ya Xanî be. Jixwe Kerem Soyly eger li pêşgotina Dostî nêrîba dê dîtiba ku zêdetir numûne hatîne dayîn di navbera herdu berhemana de⁵ û tede qet jî nehatiye gotin ew *Yûsuf û Zuleyxa* ya Xanî ye.

Mijarek din ya ku Kerem Soyly îşaret lê kirî ew e ku ew nusxe di sala 1979ê de hatiye nivîsîn û di dawiya wê de jî navê Xanî bi şiklê “Şêx Ehmed Efendiyê Xanî, Xweda Rehma xwe lê ke” derbas dibe. Lê her wekî me li jêrê di danasîna nusxeya Dostî de jî gotiye, xebata Dostî di sala 1987ê de ji ber ya Hesên Bateyî hatiye nivîsîn, ku ewa Kerem Soyly ji Suriyê peyda kiriye jî eynî wisa ji ber wê nusxeyê hatiye nivîsîn. Yanî bingeha nusxeya Dostî û ya Kerem Soyly ‘eynî ye, lê ya Soyly bi destxistiye di 1979ê de, ya Dostî jî di 1987ê de hatiye

5 Ji bo wan numûneyên di navbera herdu berhemana binêre: (Dostî 18-19).

Xulase, em bi van gotinan ne di wê îddiyê de ne ku Ehmedê Xanî berhemek bi navê *Yûsuf u Zuleyxa* nenivîsiye

zêdekirin. Anko ew îfadeya “Şêx Ehmed Efendiyê Xanî...” ne di ‘eslê destnivîsê de heye lê yê ku ew di sala 1979ê de zêde kirî, jî ber xwe nivîsiye... Wêca eger nivîskar Soyly li xebata Dostî zivirîba dê dîtiba ku ew û ew nusxeya di destê wî de ‘eynî ne.⁶ Jixwe ew nusxeya birêz Soyly behsê jê dike li cem me heye⁷ û ew nusxeyek kême e û çî îşaret jî di metnê de nînin ku mirov bibêje ew ya Xanî ye.

Di vî warî de lêkolîner gava lêkolîner binecih nekin wisa ew mesele aloz dibin û heta ku hemû destxetên berhemekê nehêne dîtin (tabî eger xetê muellîfê wê li ber destan nebe) mirov nikare tişteke qatî bibêje. Ji ber wê jî -li gor destxetên heyî- bi rehetî em dişên bibêjin ev *Yûsuf û Zuleyxa* ya Ehmedê Xanî nîne û ‘eleqaya ku di navbera wê û *Mem û Zînê* de jî nabe delîl Xanî muellîfê wê be. Lewra tişteke tabîî ye ku Selîmê Hîzanî mesnewînivîsê beriya xwe, yanî Ehmedê Xanî teqîb û teqlîd kiribe.

6 Her wisa gava Kerem Soyly behsa nusxeya eslî dike tarîxa wê xelet vediguhêze: 1330a Rûmî dike 1220, 1332yê Hicrî jî dike 1222. Lê dive ku ew xeletiya Mele Remezani jî be, lê li gor ya Dostî ew xelet in ku tarîxa nusxeya Bateyî 1330/1332 ye.

7 Ev nusxe li cem birêz Jan Dost hebû ku wî bo me şand.

Divê derheqê destxetên *Yûsuf û Zuleyxa* jî baş bête zanîn ku ji layê mustensixan ve navê Ehmedê Xanî di salên nêzîk de hatiye zêdekirin; çî ‘eleqaya navê Xanî û nusxeyên kevin nîne.

Jibilî xeletiyên mustensixan, ‘alimên wekî Xelîfe Yûsufê Bazîdî jî *Yûsuf û Zuleyxa* li ser navê Ehmedê Xanî qeyd kirine û ew jî bûye sebeb ku hem mustensix hem jî lêkolînerên edebiyata Kurdî wisa bikevine rêyek xelet...

Xulase, em bi van gotinan ne di wê îddiyê de ne ku Ehmedê Xanî berhemek bi navê *Yûsuf u Zuleyxa* nenivîsiye. Belkî nivîsibe lê ew heta niha nehatiye dîtin û ya ji wê jî muhîmtir jî, *Yûsuf û Zuleyxa* jî niha li ber dest û çavan in yê Xanî ne...✶

ÇAVKANÎ

Çetin, Nurullah. (2004). *Yeni Türk Şairinin “Yusuf ile Züleyha Hikâyesi” Duyarlığı*. Enqere: Weşanên Heceyê.

Ertaylan, İsmail Hikmet. (1960). “Türk Dilinde Yazılan İlk Yusuf ve Züleyha.” *Yusuf ile Züleyha*. İstanbul: İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Yayınları.

Kut, Günay. (2003). “Önsöz”. *Nureddin Abdurrahman İbni Ahmed-i Câmî’s The Fifth Throne: Yusuf ve Züleyha*. (Türkçeye çeviri: Ali Nihat Tarlan; editör: Şinasi Tekin, Gönül Alpay Tekin). Harvard University: The Department of Near Eastern Languages and Civilizations.

Resûl, İzzeddin Mustafa. (2007). *Ehmedê Xanî ve “Mem û Zîn”*. (wergir: Kadri Yıldırım). Stenbol: Weşanên Avestayê.

Selîmê Hîzanî. (2004). *Yûsuf û Zuleyxa*. (Amadekar: Tehsîn İbrahim Dostî). Dihok: Weşanxaneya Spîrêzê.

Soyly, Kerem. (2010). “Yûsiv û Zuleyxa: Nusxeya Ehmedê Xanî”. *Zend*. hej: 12, r. 58-61.